# Têkoşer di nava têkoşînê da

## Destan

## Azad Ararat

**Têkoşer di nava têkoşînê da**

**Destan**

**Azad Ararat**

**Tablo: Welîd Mirad**

**Çap: 2021**

**Weşanxaneya Şilêr**

**-1-**

Erdnîgarîyek: Xwedî pîrozîyan.

Ax: Ji bavkalan mayî.

Gelî û banî tev di nav hev da, warê guldexwînan. Keç û xort wekî kaşê çîyayan tev xemilandî ne. Rengînîya hawirdor çandeka kevnar ji kevin da afirandibû. Jîn dide ew, dide jîyin. Li van deveran çarenûsê xwe li çîyayan dipêça. Hevokeka tund xwe li ser hemû lat û zinaran neqişandibû, digot: "Berxwedan jêveneger e". Heke nebe nabe, li ser vê axa bibereket. Hinek jî jidayîkbûna xwe ve, mîrathilgirê vê rastîyê bûn. Diviyabû êdî guldexwîn xembar nebe. Rake serê xwe û li asîman binêre.

Karîna kurdewarî ya ku xwe li çîyayan pêçayî, xwe li ser keç û xortên çîyayî jî disepand. Wekî hilkişandina lûtkeya Çarçelayê, hilkişandin pêwîst bû, heta lûtkeya azadîyê. Zehmet, bargiranî, xwîn û xwêdan, tî, birçî, carina tazî; wekî bayê neqebên Zagrosan xweş, daqurtandina ava kanîyeka zozanî, qasî firkirina dewê koçeran tamxweş. Pê ra qayim dibe vîn. Wêneyek tê rastê, dixemilîne hemû malpêrên cîhanî, ew çend rengîn û balkêş. Di vê erdnîgarîyê da lawek za.

Sal: Hezar û nehsed û heftê û sê
Li Şemzînanê ba hilperî
Li singan dixist
Wekî pêlikên helbestên Melayê Bateyî
Bayekê henekker, dijberê qeşmeran
Kêfxweşîya zayînê dijî
Zayîneka şêrgele
Li nîveka Zagrosan

**-2-**

Cihê ku tûranan paytexta xwe lê avakirî
Ku xwedî gelek komkujî û fermanan e
Bi zayîneka duyem ra
Êş û azar gelek bûn
Lê hizrên polayî li xwe pêça
Derkete rê, giha Zagrosan
Li kêleka textê xwedawendan
Textê xwe danî
Nav û der tev azadî

**-3-**

Sal: Hezar û nehsed û heştê û çar
Mezin dibû şêrgele
Di bin baskên bavekê rewşenbîr da
Ku bijîşkê jar û feqîran e
Dê: Hilgira mîrateya sitaran
Şîrhelal bû
Mijandibû şêrgele
Bi şîrekê helal û pak
Kolan giş bûn geş
Gelekî kêfxweş bûn
Ji ber lawên rûgeş
Têkoşer, erê Têkoşer
Lîstikvanê lîstika pêncberik
Hevalên xwe dianî û dicivand
Dest pê dikir veşartok
Di quncik û taldeyan da

## -4-

Têkoşer bi hêza ku kanî û rûbarên Şemzînanê digirt dixwend. Xwendin di baxçeyê dewletê da bû lê bayê dargûz, mazî û rezan xwe li nava mejîyê Têkoşer dixist. Bayê neqeban, lutke û banîyan ji pêşîyan ra peyam radigihandin. Ji lew ra jî her kurdê ku ev peyam digirt, her çi qas di baxçeyê dewletê da bixwîne jî radest nedibû.

Ji ber karmendîya bavê xwe, carina rasterast carina jî nerasterast rûyê dewletê yê cemidî û înkarker ra rû bi rû dibû. Carinan lêdana mamosteyên faşîst karê xwendewanên welatparêz bû. Di dibistan sazî û dezgehên dewletê da, dubarekirina siloganên dewletê ji neçarîyê bû. Lê li kuçe û kolanan jî qîrîna zarokên kurdperwer olan dida. Li çîya û banîyan dengê kalaşnîkofan kêm nedibû. Ji lew ra jî pîremêr û pîrejinan digotin: “Êdî em dikarin bi dilekî asan koça dawî bikin”.

**-5-**

Di çaryeka dawî ya sedsalê da
Tevdaneka bingehîn pêwîst bû
Ji zilma pênsed salî ra bes bû êdî
Tolhilgirek pêwîst bû
Ku hilîne tola jar û feqîran
Bidarvekirî û koçberkirîyan
Di gund û newalan da kuştî û birîndaran
Kurd xwedî mîr, şêx û melayên serhildêr bûn
Lê hinek ji wan, ji binyada kurdînî qetîya bûn
Li dijî wan jî derketin
Hişê kevneperestan derbas kirin
Her pêdivîyek bû
Bi paradîgmaya nû
Lêvegerek li dîrokê hebû
Ahûra Mazda diferme
Ahrîman kişîya hev, qermiçî
Zerdeşt hate ziman
Ev e Peyamnêrê hemû deman
Li bajaran, li waran
Dawî li pederşahîyê dihat
Lewra tev keç û xort
Ji vexwendina koletîyê ra gotin: “Bes”
Tev ketin nava dîlana şoreş û şoreşgeran
Yek ji wan Têkoşer
Dê bibe sergovend
Sergêr û pratîsyenê dozê

**-6-**

Di Çalakî û şahîyan da
Dijî kevneperestî, mîletperestîya binxet
Dagirkerî, mijokdarîya serxet
Agir hatibû dadan
Jê mayîn erzanî, tevlî bûn xweşhalî bû

**-7-**

Dema ku gel bi PKKê ra bibû yek û serhildan belavî welat bibû, di demekê herî germ yê şerê gerîla da û piştî şehadeta birayê xwe ku li Zelê şehîd bibû, Têkoşer tevlî nava refên gerîlayê bû û bû kadroyekî PKKê. Ev hîna di salên xwe yên destpêkê da, di şer da, cengawerekî wêrek bû.

Erê, li waran hestîyên pêşîyan hene
Û ev çend gorbihuşt
Dengê şûr, mertal û riman di dema xwe da namînin
Digihên nebîyên nebîyan, heta îroj
Dengê şûr û mertalên dagirkeran
Dimînin li ser latan, zevîyan, serkanîyan
Mîna tomar kirina komputeran, tomar dibin
Dimînin hetahetayê
Qîrîna cengawer, keç û xortan
Bûk û zavayan, pîremêr û pîrejinan
Xwe digihînin li rojan, salan; wisa jî nûnifşan
Yên ku bibihîzin wan axîn û nalînan
Dibin agir û pêt, dişewitînin
Tabûr, alay, kol orduyan

**-8-**

Ew bejinzirav, qertalê latbilindan
Ji hevîrekî kurdewar hatibû sitrandin
Pijandibûn wekî tolhilgirekî
Ew di hest û helwestên xwe da
Ji heval û hogiran ra karxezal
Ji dijmin ra gurzekî yaman bû
Pê ve dida ji nişka ve, li quntaran, giran
Çalakê çalakîyên şevtarîyan bû
Karakol bi karakol, tabûr bi tabûr
Piranî jî tabûra Bêsosin
Erê, ji ling û mil ve birîndar
Lê di çalakîyê da biserketî
Gerîlayekê hemdem bû
Li xwe pêça bû gabardîn, rext û kalaşnîkof
Vegirtibû mekaba zer
Nava xwe zirav, bejna lihevhatî
Por, birû, bijangên reştarî
Hinarok, dêm tev ew çend nûranî
Ken û bişirîn tim xwe li naverastê dixist
Ew qas şirîn û heval bû
Mîna êvara Newrozê, lihevhatinek bû
Çalakîkerê şevên Kurdistanê
Berbang bi çalakîyan pêşwazî dikir

**-9-**

Hîna di salên destpêkê da Têkoşerî dest bi fermandartîyê kir. Yekem erka xwe alîkarîya fermandarê mangê bû. Li ser vê xeta fermandartîyê, dê salên dûr û dirêj di hemû astan da fermandartîyê bike. Ew wekî bayê zozanên Zagrosan raperî. Bi gavên tekûz da ser şiverêyan. Dimeşîya, her ku dimeşîya bi dar û ber, taht, lat û zinaran ra dibû yek. Xwezaya çîyayan hişk bû. Bi vê hişkbûna xwe ra mirovên serhişk, birik û xweser ava dikir. Deştik, zevî û qelaşê teht û latan; sosin, guldexwîn, sorik, beybûn û bi hezaran cûre kulîlkên xweragir hene. Pincarên soryaz, guhreş, kereng hebûn û kîvork ecêbeka xwezayê bû. Hişkî û nermî ketibû navhev bi vî awayî. Vê xwezaya xweşik her ku diza, bi xwe ra kesayetên li hember dagirker hişk, tund; li hember gel, heval û hogiran kesayetên xweşmirov û mîna kulîlkên welat wisa bi xeml dianî rastê ku wekî xemlên cejna Newrozê bûn. Bejn û bala keç û xortan, dema dibûn gerîla, mîna xwedawend û xwedayên azadîyê yên kevnar yên vî welatî li wan dihat. Têkoşer di nav van refan da tim di rêzika pêşîn da bû.

Di destekê da destikê çekê
Di destekê da tembûr
Şerker û şervanek bû
Li gel muzîkjenî
Xwedî awazê pak û zelal
Ev bû pêşengê şerê man û nemanê
Di nava geşt û gerekê da bû
Ji Qendîl heta Heftanînê
Bi daketina newal, hilkişandina çîyayan ra
Pispor û şareza dibû
Gav diavêt ber bi biserketinê
Gavên gerîlatîyê; dagirtî bi hiş û hizir bûn
Li gel çavên hingivînî
Xwedî awirên pilingî bû
Dost û yar bû li gel pezkûvî, karxezalan
Li nav xwezayê da li pey zayînan bû
Zayînên Zerdeştî, Apoyî
Mîna xwedawenda Sitar li asîman
Wisa jî biber û bereket bû
Mînanî zevîyên Oremarê

**-10-**

Qeşengê Amarayê bi gurzên ji agir lê dida. Ji holê radikir kevneperestî. Bi sentez, bi çêkerî, Mîtolojî, ol, felsefe, zanist tev; civandibû bi hizreka civakî. Tevî ku zordarên nola levîathan tev bibûn yek, diherikî mîna lehîyên biharî yên best û bestikên Besta; ji Herekolê ber bi Cudîyê ve. Dema ku xiyanet bû alîkar, xiyaneta nav kurdî, nav partî û kêmhevaltî, hogirtî; hûtan derdest kir panzdehê sibatê hezar û nehsed û not û nehan. Bi wextekê ew çend tengav da, rastîya kesayetan derdiket holê.

Bi vî awayî:
Hinek bûn wawîk û çeqel
Di bertengekê şoreşê da
Û sûtal di xeta navîn da bûn

Tolazên demê
Li ber serê xwebexşan disekinîn
Ji pêşîyên gorbihuşt
Ji Newala Qeseban, Gelîyê Zîlan
Ji kuştîyên kiryar ne dîyar(!)
Li erdê dirêjkirîyên newrozan
Ji Vedat, Ap û Şêx Mihyedînan
Ne şerm hebû ne haya

Mîratxwerî feraset bû
Li gel kaşo Apoyîyan
Malmîrat bûn tev
Li ser rêkên çeqelan

Dil û cerg sotî jî hebûn
Dê zarok tev milîtanan
Beden jî dan ber agir
Diparastin Rêberê Rêberan
Mîna xeleka ji agir

Li Zagrosan destwerdan pêwîst bû
Ku biparêzin
Textê Sitar, Ahûra Mazda
Û xeta azadîyê ya Ocalan

Têkoşer tevî hevalan
Rêwî bûn wekî gelek caran
Di çente da
Parastina Gelekî, mîna hingivê latan
Wisa çareserker, wisa jî birêveker
Li Zagrosan baz, qumrî, bilbil, quling, kewa gozel li gel ribat
Pezkûvî, xezal, kîvroşkên çolteran
Guldexwîn, sosin, beybûn û sorik
Tev di pêşwazîyê da bûn
Li hember rêzdaran
Rêz girtibûn bi dilxweşî

Têkoşer ket nav hevalan
Hilda ala sorxwîn
Ku hatibû pê bi xwîna bijarteyan
Li qûntarê Çarçelayê
Li ber lateka qehîm
Di bin dargûzê da
Vediguhest kelamên giravê
Bi vî awayî xweşhal
Şên dibûn dêmên gumanbar
Dişidandin rext
Kalaşnîkof çeprast
Cih teng dikirin
Ji çeqel û rovîyan ra

Hizir ji nû ve pişkivî bû
Wî gav bi gav vediguhest
Îman tekûz dibû
Gerîlatîya nûjen dihate rastê
Bi kalaşnîkof, pênûs û lênûsê
Paradîgmal veguhertin hebû
Keç û xort tev xweşiktir dibûn lê
Xweştirîn qeşeng dîsa Têkoşer bû

Gerîlayên Zagrosan
Tevî gelê şoreşger
Di nava lêgerînan da bûn
Êdî rê ronî, armanc dîyar e
Gerîla û gel yekdest, ji nû ve
Dan ser rêya ronî ya Apoyî

## -11-

Qendîl: wekî textê keyayên kurdan e.

Wisa bilind, muhteşem, rakişîner, destbirakê ewran, ew ewrên tijî hestên kurdî barkirî. Daristan û zozan berdewamê hev û du ne. Di ser da gelek lutke hene, xweştirîn mekan in ew, ji egîd û qeşengên kurdan ra, yên duh û îroyî. Gundîyên jar û belengaz, pêşmergeyên dilsoz, îro jî gerîla; rim, şûr û lûleyên çekan, dirêjî dilê dagirkeran dikirin, dikin û dê bikin.

Çar demsal jîngeh e Qendîl. Raxistîye bi baxçeyên xwezayî. Gelî û newal; kaş û girên xwe wekî berbûkên kurdan in. Nazik, nazdar û bedew in. Li Qendîlê kurd mîna darmazîyên wê ne. Bi kok, bi rik in. Kurd; mîna şax û berûyên darmazî ne; naqedin, naqelin û her li ber xwe didin. Dijîn û didin jîyandin.

Camêr û canikên kurdan
Xwedî şal û şapikên caw gabardîn in
Pêlavzerê latan, wekî bazan in
Li ser şutikê rext şidandin
Di dilê Qendîlê da
Danîn zanista şer
Bi navê “Akademîya Mahsum Korkmaz” ve
Ew e remza hemû tebaxan
Egîd e ew, Egîdê awirê şervanan

Têkoşer di nav akademîyê da
Hînker bû carinan
Carinan şagirtê dilsoz

Bi “beyanîbaş” a berbangê
Rojê dest pê dikir

Diruşmeyan olan didan
Di îçtimaya serê sibehê da

Li gel xwêdana werzîşê
Tev liv û tevger hebû
Heta taştêya serê sibehê

Waneya yekê
Fermandarîya demê ye
Li gel modernbûna wê

Danê êvarê
Rast dikir nîşangeha çekê
Li diwazdehê da lê dida
Diperitand nîveka hedefê

Voleybola êvarê
Hema jî derbas dibû
Ken, henek û laqirdîyê

Etûda şevê
Mîna paşîva berê

Nobeta nîvê şevê
Xweş dianî xewa serê sibehê

Di dawîya dewreyê da
Hebû bestina platformê
Rexne giran
Li xwe mikurhatin ji dil bû

Di platforma xwe da
Wî serê xwe bilind kir
Û got:
“Di serî da
Ji Rêber Apo
PKK û PAJKê
Şehîdên şoreşê
Şoreşgerên ku di zindanan da ne
Gelê welatparêz
Mirovahîya pêşverû
Ji hevalên amade ra
Soz didim, soz didim, soz didim”

Ji pişt ra jî çepik lêdan hebû
Deng digiha çûk, kew û qumrîyan
Mazî, çinar û kinêran
Mîna dengê mizgînîya biserketinê
Û bi du bêjeyan bidawî dibe
Yanî “SERKETIN HEVAL!

Di şahî û ahenga dawîya dewreyê da
Lê hebûn sitran, skêç û laqirdî
Muzîkjen û xweşawaz
Strana Rûbarokê li ser lêvan
Dihejmart navê şehîdan
Têkoşer e ev, hevalê hevalan

Dawîya dawî veqetîn heye
Ji bo gihanheveka nû
Lê ya rast; zehmet e xatir xwestin
Bi çavşilî hevhimêzkirin
Dîyarîdana hev û
Li ser lênûsê herikandina hestan
Dilê xwe qetqetîkirin û
Li gel her yekê qetek birêkirin
Va ye dilgiranî û xembarî

**-12-**

Piştî perwerdeya demê
Ev bû pratîsyenê hizrê
Li seranserê Balekayetî
Danî çeperên cengî
Li gel jîn û jîyanî
Dida perwerdeyê leşkerî

Di sala du hezar û sêyan da
Zivistanê heta biharê
Derbas bû bi liv û tevgerê
Di bin venêrîna
Sergêr û serkêşê PKKyî

Bihar heta payizê
Nuqta danî Sûredê
Neqebên gir û lûtkeyan
Tev mîna doşegên malê

Tekmîl û civînan da
Ev bû parêzvanê xetê
Bi xwe ra dianî
Rastî datanî holê

Li gel gundîyan
Koçer û şivanan
Dikir hevaltî

Wekî lawê gel
Lihev dianî xebata civakî
Mîna galgaleyên serkanîyên zozanan

Li Qendîlê serpêhatî xweş bûn
Lê dem hatibû
Jê çûyîn pêwîst bû

**-13-**

Ji Qendîlê bi rê ket
Li gel koma hevalan
Bihara du hezar û çarê

Çîyayê Karoxê pîva
Bi gavên lez û kelecanî

Li gel bêhna cehterê
Ji newal û deştikan ra têperî
Di bin baranekî hur dibarîya da
Giha neqebê Garê

Darçinarên çeman
Mîna pîremêr û pîrejinan in
Kevneşopî nîşan didan
Wekî rêxweşkerê gerîlayan

Têkoşer rawesta di bin darçinarekê da
Mîna gewdeyê darê
Tîk sekinî û dimeyzand
Gerîla tev amade bûn

Têkoşer hate ziman û got:
Heştê û du heta vê gavê
Mêvandara hevalan e ev darçinar
Şahida çîrok û çîvanokan e
Gelek serpêhatîyên gorbihuştan
Binêrin gewde û şaxan
Bibînin silûetê wan hevalan
Pêşîyên me pêşeng bûn
Hûn jî di vê rêkê da
Bibin hêvîya nûnifşan
Biqelînin koka dijmin û xayinan

Piştî vê xweş galgaleyê
Di sergêrîya Têkoşer da
Komê da rê

Li newal, deştik û zevîyan ra rêve çûn
Li Deşta Kafya ra derbas bûn

Dêralûk heta Gelîyê Zê
Rêwîtîyeka şadmende bû

Di nav xwezaya xweştirîn da
Li Zê kon danî Têkoşer
Hewildar û xîretkar bû
Xildanên nû pêwîst bûn
Çûyînên li qadên nû
Li berbangên cih û warên nû
Serpêhatîyên nû pêwîst bûn
Çûyinek ber bi Botanê ve heye

Li nîveka şer da
Xweşcih û war in
Gera Berana, Kato Marînosê kurdewar

Li Fereşînê ku xemla zozanan e
Dê xwîn jî birije
Li ser kulîlk, taht û latan

Botan e ew. Lê ne gorên dagirkeran
Li ser singê xwe hildide
Şoreşgerên hemdem, berxwedêran

Vê carê Têkoşer e
Rêwîyê şiverêkan
Dûrbîn di dest da
Wekî bazê latan
Bêhn diçikîne li dijmin

Li teraş û taldeyan da vedişêre
Tev heval û hogiran
Lê, lê dema lêdanê
Êrîşker e mîna pilingan
Dide kişandin oxweşek
Wekî oxweş a Hiseyn Mahiran
Di dilê welatperweran da

## -14-

Têkoşer gerîlayekî şareza bû. Dilsozê dozê bû wekî her gerîlayekî lê ew di heman demê da pêşeng bû di her warî da. Di nav zehmetî û xweşîyên jîyana gerîlayan da, tim çavkanîya moralê bû. Bi qerf û henekên xwe gerîlayên ku pê ra bûn perwerde dikir. Li qada Botanê gerîlayan taymetmendîyeka Têkoşer a bijîşkî jî di bûyera aşûtê da nas kirin. Çawa ku çar gerîla li kampa zivistanê dema ku derketin derva man bin aşûtê da; Têkoşer di nav bêderfetîyan da bi ta û derzîya asayî ya dirûnê hevalên xwe ji şehadetê rizgar kirin. Ji lew ra jî Têkoşer ne tenê fermandarek ji rêzê ye. Ew mamoste, fermandar, bijîşk bi kurtî û kurdî sergêrekê şareza yê gerîlatîyê bû. Gerîla û fermandaran jê hêz digirtin. Dilê wan tekuz dibû. Ji ber hebûna Têkoşer tim ji pirsgirêkan ra çare didîtin. Pêşîya xwe vedikirin û wisa jî di pratîkê da biserketî dibûn. Di nav operasyonên dijmin da wekî ava kanîyên zozanan diherikîn. Di hingên guncaw da wisa jî lê didan ku qet dijmin bawer nedikir ku ew gerîla vê ecêbê bîne li ser serê wan.

Di navbera Fereşîn û Katoyê Marînosê da
Geştek bi qestîka kirin
Sîxuran xeber gihand tîma xencerê
Têkoşer taktîsyenekî bi vî awayî bû
Rêbazeka xweş bû ku
Pê dijmin kişandin li nav bejahîyê
Berêvareka payizî
Danîn kemîneka çepelkuştinê
Sergêrê çalakîyê Têkoşer bû
Mîna mozeka kîndar
Gerîlayan pê ve da
Bi bombe, kalaşnîkof û BKCyê
Ev qaşo tîma xencerê bûn
Lê pergala wan belav bû
Sêzdeh kuştî man li erdê
Pilingên Rojî
Bezîn ser bi lehengî
Hildan tev çek û rextê kontrayan
Li gel kel û pelê leşkerî

Wisa jî biserketî vegerîyan Katoyê Marînosê
Têkoşer tevî heval û hogiran
Xwe spartin teht û latên Kurdistanê
Gerandin dîlana bablekan
Ev bûn tev, delalîyên ber dilê dayîkan

**-15-**

Rêbertî bi têkoşîna bîrdozî dest bi têkoşînê kir. Wekî ku tê gotin: “Di destpêkê da kelam hebû”. Yanî mirovatî bi fikir û hizir dest bi jîyanê kirîye û wisa jî pêş ketîye. Ji lew ra jî di Tevgera Azadîyê ya Gelê Kurd da dîyardeya sereke perwerde ye. Her şoreşgerek berîya her tiştî bi kelam dest bi têkoşînê dike. Ji ber ku kelam nebe emel, dê xizmeta çi bike dîyar nabe. Wekî ku di têkoşîna hin partî, serek û kadroyan da tê dîtin, kelameka rast nebe xizmet ji dijmin û bi awayekê teng ji malbatê ra tê kirin.

Têkoşer!
Li gel akademîya leşkerî
Derbasî dorhêlaka bîrdozî bû
Bi navê “Hakî Karer” tevgerek hebû
Li qûntar û taldeyên çîyayan

Hakî Karer!
Dema nas kir Evdellah Ocalan
Bi kûrahî çû navê
Bû pratîsyenê bîrdozîya Rêbertîyê
Di nîveka dilê wî da cih girt
Ruhek bû
Parçeyek ji ruhê Rêbertî
Lewra wî Rêber Apo dida jîyandin
Li her qad, kar û xebatê da

Ciwan li dora wî dicivîyan
Didan li ser rêça Rêbertî
Erê, ew bû ruhê veşartî li bajar û çolteran
Eşkera dikir tev rastîyên nixumandî

Lê hezar heyf û mixabin
Dijmin plan li ber danî
Digerand dek û dolabê qehpetî
Li êvareka Dîlokê
Di kombûneka şoreşgerî da
Tetîkkêş tilî danî li ser tetîkê
Di nav xwînê da
Hiştin çelengê ber dilê kadroyan
Lê belê, heyfgirtin taybetmendîya sereke bû
Ta niha jî
Di kuştina her çepelekî da
Tola Hakî tê hildan

Wekî serhildan û berxwedanên pêşîyan
Gorgihuştkirin nebû axir zeman
Bi têkoşîna dûr û dirêj ra
Niha jî li qadan, li cih û waran
Danîbûn Akademîya Hakî Karerî
Tê da şagirt bû Têkoşerê Geverî
Lawê kolanên Şemzînanê
Derwêşê serhildana bîst û nehan
Di şîroveyekê da wiha hat ziman:
“Armanc: civaka komînal e
Rê: parastina rewa ye
Bîrdozî: ronahîya rê ye
Ger di fermandaran da hebin
Diçe serî ev doz
Rojekê ji rojan”

Herêma Garê çê ye
Heval û hogirê kî ye?
Destbirakê hevalan e
Gerîlayên azadîyê lê ne
Akademîya Hakî Karer danîne
Têkoşer balkêş û rakişîner e
Çek û rext tim li bejnê ye

Akademî li Garê ye
Garê tev newal û gir û tap in
Di nîvekê da deştikeka hingivîn e
Gêrîla lê dilîstin
Gok û birkê û bablekanê
Xweşmêr û heval û hogir
Her Têkoşer bû

Li deştê kanîyek der diçû
Der û dor tev tûzik û mendik
Xox, mew, alûc
Xweşfêkî bûn li deştikê

Ber bi jêr ve çem diherikî
Geh dibû sulav geh dibû hop
Qetek ji bihuştê bû, li ser erdê
Hatibû li hev li Gelîyê Hazirê
Malevan û masîgir dîsa jî Têkoşer bû

Têkoşer! Di jîyanê da diherike, di jîyanê da
Bi ber û geş e timî
Jîyanî dikir perwerde
Wiha jî her biserketî
Bi hêvî û bawerî
Qedand akademîya Karerî
Dest pê kir pratîka her carî
Xweşlêdan e tev
Xencer di dilê hovan da çikandî

**-16-**

Ocaxa PKKê ye
Wekî ocaxa zerdeştîyan
Wekî înzîva û di xwe da çûna pêşîyan
Pêşengan digîne ji bo dozê
Xwe rexnekirin û mikurhatin
Rêgeza sereke ye di tê da
Kesan di xwe da digerîne
Bi yek loqma yek jî hirka
Ocax e bi navê Sakîna Cansiz e
Bi bîrdozîya rizgarîya jinê
Bi zanista jinnasîyê
Dihûne cîhana azadîya jinê
Hişek tê rastê
Digîne hev
Tev canik û camêran

**-17-**

Li Xakurkê
Li gelîyê darçinaran
Biharek hatibû pê
Dengê teyr û tilûran
Her li erş û asîman bû
Li erdê xweş dixwend kewê ribat
Kulîlkên serî hildayî
Xemla gelîyê bûn, wekî xemla bûkan
Têkoşer!
Li banî, li neqebê
Awirek avêt li ser gelî
Mînanî awirê pilingan
Piştî bêhnvedanekê
Hilda çenteyê piştê
Qayişa kalaşnîkofê avêt milî
Wisa ji xwe bawer
Da li ser şiverêkê
Şiverê mîna Kadizê ye
Li galaksîya Kadizê
Çend mîlyar gerestêr lê hebin
Li dora şiverê
Li ber çavên Têkoşer
Ew çend zîndewer û
Keskahîyeka rakişîner hebû
Peroş dikir dilê Têkoşer

Ku giha nuqta ocaxê
Li gel heval û hogiran
Dest pê kir xweş galgale
Li ser şoreş û şoreşgeran

**-18-**

Wane hatin xêzkirin
Waneyên dîrok, civak û şeran
Li gel Rastîya Rêbertî
Hebû civaknasî, jinnasî û pêşengtîya şoreşgertî
Ji Şerê Gel yê Şoreşger ra
Pêwîst bû pêşeng û pêşengtî
Ji ber ku avakirin û înşakirin bû
Erkê demê ji bo her kesî

**-19-**

Têkoşer!
Geh li dîwanê birêveber
Geh di komîsyonê da hînker bû
Carinan şagirtekî dilsoz
Serkanîya peroşîya ocaxê bû
Hêlîna xwe datanî bi vî awayî
Di dilê her heval û hogirî da

Di şahîyên nav perwerdeyê da
Hînkerê dîlanê bû
Digerand serî, bi sergovendîyeka qencî
Helbestên evînî dihûna
Li ser welat û tev keç û xortan
Her yek ji wan qasî çîyayan
Bi heybet, biryardar û heta bixwazî berxwedêr
Her helbestek stranek bû
Li gel tembûr û awaza zîz
Distira bi melûlî
Carinan kelecanî
Lê tim li ser bû
Hestên berxwedêr, biryardar û encamgir

Di nava ocaxê da
Derwêşekê sade
Ew qas jî kedkar û çak bû
Ji nû ve fikirî
Pêşeroj, roj û paşerojê
Mejî dagirtî bû
Hizir û ramanê biserketinê
Mutleq dijmin bibinxistinê
Têgihîştibû ji nû ve
Paradîgmaya nûjen a Rêber Ocalanî
Hatibû gihandin
Bo azadî û serwerî
Wexte dê bicenge êdî
Bi bîr û bawerîyeka hemdemî
Ji ocaxê hat veguhestin bi vî rengî

**-19-**

Ji ocaxê hat veguhestin bi vî rengî
Hilperî û da ser rêya rûmetê
Çek di dest da ye
Wekî gurzê Ristemê Zalî
Dê bicenge wekî her carî

Têkoşer!
Wekî şêr û pilingan
Dida pey dijmin
Ji ber bipaşdaxistin
Dervayî demê mayîna kurdan
Diviyabû leztirîn lezekê
Xwe bigihîne cihan û waran
Diviya xwe berde
Nav deştan, bajar û bajarokan
Navçe, gund û gundikan

**-20-**

Berê Têkoşer li Rojavayê Kurdistanê bû
Li gel kurdên jar û bindest
Pêdivîya ereban, ermenan, asûran jî
Bi Têkoşer hebû

Hêvîyek hatibû rastê. Bi keda Rojî encamek bi dest ketibû. Canik û camêran, bêhesab dabûn li ser şopê. Ezîzê Ereb yek ji wan bû li gel Şîlan û Smayîl û Elîyê Dirêj. Ji ber ku rê rast, doz mafdar bû, dayîkan bi destê xwe keç û xort dişandin nava şoreşê. Her wiha xebatkar û çalakên xurt bûn ev dê û bavên şehîd, birîndar û têkoşeran.

Lê belê

Ji ber azadîya maqûl, rengîn û berbiçaw; zirhêzên dinyayê dicivîyan, tev çepel û tolazên herêmê. Pîlan li ser pîlan danîn. Ji bo vegerandina koletî û bindestîyê. Qeyd û bendên polayî amade dikirin. Ji bo zîndanekê fireh li ser rûyê erdê bispêrin. Bi ezmûnên ku ji hemû qirkirinên ji dîrokê rû dane girtine, êrîş dikirin. Tirseka cîhanî ava dikirin, bi vîdeoyên ku çi hişê asayî hilnagire. Li gel teslîmgirtina bedenî, hiş û hestên mirovan jî zevt dikirin. Bazara firotina jinan danîbûn, bi navê misilmantîyê tevan dikirin gawadî. Xwîn diherikî newalan. Bîrên bêbinî yên deştên bêser û ber tijî xwîn dikirin. Bi navê Allah û Mihemedî, xirabtirîn kar kirin. Di eslê xwe da, Xweda kuştin, dîn kuştin, çanda zengîn binax kirin û ew bixwe wekî xwedayan daketin li ser rûyê erdê.

Li hember pêla vê zilmê, keç û kurên xwedî rêûresma zerdeştî, bend li ser bend danîn. Mertal girtin dest. Şikandin tirsa çêkirî. Li ber xwe didan, wisa jî biserketî. Têkoşer jê nema, demildest xwe gihand hewarê.

**-21-**

Parêzvanê li Serêkanîyê
Di pevçûnan da bû
Kolan bi kolan
Li hember kujerên biyanî
Çete û xwefiroşan
Destan dihat nivîsîn
Û berxwedan serwer dibû
Têkoşer her li pey azadî û
Bidestxistana mafan da bû
Carinan hevalî dicivand
Dest pê dikir xweş galgale
Carinan jî bêtêl di dest da
Sergêrî dikir, sergêrîya şerê rûmetê
Dema ku di bêtêlê da bang dikir
Û digot: “Lêde”
Di bin lingên nemirovan da
Erd dihejand, dor li wan teng dikir
Bi kalaşnîkofê lê dida gelek caran
Lê carinan jî destikê doçka digirt
Bi nîşaneka rast û dirust
Pêva dida û çeperên berezan dirûxand

Li herêma Cizîrê
Difetilî bi plan û rêk û pêk
Ew bû timî
Xoşava li ser lêvên hevalan
Lê di dilê kujeran da
Mîna rimekê bû
Rêçek hişt li şûna xwe
Rêyek raxist
Ber bi asoya azadîyê
Û jîyanek hate rasteyê
Ku dilxweşkerê nûnifşan bû

## -22-

Êrîş li ser ereb, kurd û mirovahîyê hemû dest pê kirin. Mîna pêlên deryayê belav dibûn. Ji kû derketin? Çawa pêş ketin? Derfet bi çi rengî bi dest xistin? Nedihat zanîn; lê ew her mîna karesatekî diherikîn. Dirûxandin, disotandin û gund û bajar kavil dikirin. Bi destdirêjî, revandin û danîna bazarê û firotina jinan diketin înternetê û li ber çavên dinyayê diqîrîyan; Allahû Ekber. Ew Allahekê cuda bû. Evdê wê jinfiroş; yanî gawad bûn. Geh bi kêrê ji qirikê serî dibirîn, geh jî bi şûrekê pehn ji patikê serî difirandin. Her digotin: Allahû Ekber. Ew Allahek wisa bû ku: Ji dîrokê mîna hutekî serî hildabû û bi evdê xwe mîna cinawiran mirovahî malmîrat dikir. Ji Kerkûkê ta Efrînê di erdnîgarîyeka dûr û dirêj da, welat rûbirûyê rûxandinê bûbû. Derba mezin li Şingalê ket. Kobanî li ber xwe da û her li ber xwe dide, lê li Mexmûr, Wargeha Şehîd Ristem Cudî, Hewlêr, Kerkûk; tev dibin metirsîyê da bûn. Dihat xwestin têxin bin nîrê hovan, dinya nedîtîyan.

Partî û pêşmerge, rewşenbîr û gel tev civîyan. Hewar dikirin û bang dikirin; da ku dakeve gerîla were hewara wan.

Berpirsîyartî ferasetekî çêker e. Ji kul û derdê gel ra dibe derman e. Soza ji bo gel pîroz e lê mixabin, ne di hişê her kesî da ye. Lewra PKK berpirsîyar tev gerîya, pêwîstîyên sincî û wijdanî bicih dianî. Ev partî xwedî lehengên navdar ên bi hezaran bû. Dê bike şêrgeletî û binivîse dîrokeka nû wekî her carî.

Li Zapê
Têkoşer derket ji nuqtê
Ber bi daristaneka mazî
Ku giha ber darmazîyeka kokqalin
Kalaşnîkof li ser
Hedefê dîyarkirî rast kir
Ew bi vî rengî eyar dikir
Çeka kûjera kirêtî
Ku temamî karê xwe bidawî kir
Berê xwe da serşokê
Cil û bergê xwe şuşt û bi şûn da
Pêlav û şûtik xiste nav av û deranî
Raxist li ser şaxên daran
Şal û şepik û kefîya koçerî

Hopa ku li gelî bû
Xwe berda nav bi temamî
Ev pisporê avjenî û melavanî
Wekî masîyekî di nav da digerîya
Pê ra dikir kêf û şahî û laqirdî
Ku derket ji avê
Wisa sivik mîna çûkan
Pêra-pêra li xwe kir ji nû ve
Ev şal û şepik û şûtik
Girêda rext û hilda çek
Çû ber bi nuqta hevalan

Rojekê ji rojan
Serê sibehê zûka
Hilda zend û bend
Rûşûştin karek bû helbet
Piştî taştêya wê sibehê
Xeberdar hat gihand xeberê
Têkoşer tîk sekinî wisa jî amade
Meşîya bi gavên tekuz û wisa jî ji xwe bawer
Ha wisa giha ber jûra sergêrîyê
Pêşwazîyek hebû ber derî
Wisa jî bi hev ra rast û bibawer
Toqa kirin du hevrê
Û vexwend nava jûrê wî sergêrî
Hal hewal pirsîn û galgale
Qal zivirî li ser kar û xebatê
Fermandar bi hêrs û kîn bû
Ji ber ku li çol û çolistanan
Namûs dihat firotanê
Ax dihat dagirkirin
Roj mîna qîr û ziftê dibû tarî
Destwerdanek pêwist bû
Li Mexmûr ta Kerkûkê

Têkoşerê fermandarê demê
Her amade bû
Bi hest û hizir û çekê

Roja çûyînê
Ku şîyar bû ji xewê
Tenişta çemekê Zapê
Li ser darçinarê
Sivore xil dida xwe
Tîvilan dixwend bi aheng, mîna orkestrayê
Kewa gozel dixwend li ser latê
Gul û bax û baxçe
Li derdorê bîn dida
Muhteşem lihevhatinek hebû

Wê sibehê li wê nuqteyê
Têkoşerî şûtik li bejnê şidand
Yelek li xwe kir û
Çente avêt li ser piştê
Di rêza rêwîyan da
Li pêşî sekinî ku
Bide soza biserketinê

Piştî kurteaxavtinê
Tevî hevalên xwe
Hate pêş bo xatirxwestinê
Ku temam bû seremonî
Dest pê kirin û qîrîyan dirûşmeyan
Ku olan didan li lat û zinaran
Xweşmêr û canikan bi vî awayî
Bi rê kirin ber bi biserketinê
Û her gotin: “Bijî Rêber Ocalan
Biserketin, biserketin û her biserketin”

Komeka bijarte
Li ser şiverêyan dimeşî
Bi aheng, bi awa, bi qaîde
Ji dola dawî ku xwe berdan ser rê
Maşîne amade bûn
Bona hilgirtin û çûyîna ber bi Qereçoxê

Li gund û bajaran
Zarok, jin, mêr tev
Derketin pêşwazîyê
Mîna cejna Newrozê
Nebîyên Kawa bûn tev
Di dest da gurzê lêdanê
Bo piştê li dijmin bişkînin
Û her wisa herikîn
Tevî coş û peroşîyê
Ruhek hat li dilên kurdewar
Her wisa ev bûn şayenî bavkalan
Li quntara Qereçoxê

Mexmûr!
Wargeha Şehîd Ristemê Cudî
Ev gelê penaber
Sih sale bedelên giranbuha dayî
Niha li ber devê hûtan
Gelo dê paşerojek çawa
Serpêhatîyên bi çi rengî bijî?

Têkoşer û hevalan
Ku gihan Qereçoxê
Dest pê kir liv û tevger
Her hereket bû bereket
Û li kolanan
Ev zarokên pêxwas
Li paşila dayîkan
Wisa bi rûkenî
Dinêrin li jor, li banî
Heta berê beyanî

Li ber tenûreka sitaran mayî
Nanpêjek gava ku çav li Têkoşerî kir
Hate ziman û wiha got ku:
“Birînên me nakewin
Heta azadî misoger bibe
Kenên zarokên me
Di dêmên wan da dicemidin
Xembar dibin û nîvçe dimînin
Ji ber alema çete û sutalparêz”

Têkoşer bersiv da bi rûkenî:
“Gerîlayê Azadîya Kurdistanê ne
Tev kur û keçên gel in
Canik û camêr in
Mertalên zindî ne bo we
Rim û şûrê Medî ne
Nagerin, ji dozê naqerin
Heta azadîya misogerbûyî”

Li wargeha Ristemê me
HPGyîyan çek û rext û bombe hilanî
Li gel hêza cewherî
Tax bi tax tevger hebû
Bi vî halî

Mexmûrîyan hilanîn wêneyê Rêbertî
Li gel ala partî û pergalê

Sûretê gorbihuştan hebûn
Li malan, sazî û dezgehan

Dest pê kir nobedarî bi kêfxweşî
Bi şev û roj
Dewrîye digerîyan li derdor û quntarê
Li serê çîya tev senger û çeper
Amadekarî hebûn
Wekî arîfeya axir şer

Têkoşer mîna cîwa bi tevger
Tîm bi tîm
Taxim bi taxim
Vesaz kir hêzên bergir
Her deverê bend danî
Mîna pêt û agir

Heştê tebaxa du hezar û çarde
Berebeyanî hatin kom bi kom
Mişk û dupişk û cird bûn
Bi tekbîr û şûr bûn
Navê dizî û talanê xenîmet danîbûn
Bilind kirin tilîka şehadetê
Ketin kolan û kuçeyan
Dor li Qereçoxê girtin
Da ku kok û binkoka kurdan biqelînin

Têkoşer got: “Bes heta vê derê”
Ferman da ku bicengin
Û xebitîn tev kalaşnîkof, BKC, doçka
Ketin nav hev bi bomba
Qereçox şûştin û pak kirin
Lê Denîz Firat bi gor kirin

Li nav wargehê şêrên me
Dan dûv rovîyê wan deştan
Şopa pîyên wan jî nehiştin
Pordirêj lê aqilkurtên Daişîyan
Bi kûzekûz mîna çeqelan revîyan

Hevalan, milîsan, ciwanan
Berê lûleyan dan jor
Pîroz kirin biserketina hemî kurdan
Lê ranewestîyan
Tekuz kirin senger û bend
Nehiştin bigihin Hewlêrê
Ha wisa jî parastin rûmet û namûsa kurdan

Serok û serkirde û giregiran
Berê xwe dan xwedan kerametan
Li ser lihêf û doşekan
Sond xwarin bo yekîtîya kurdan
Aman, aman, aman

Parêzvanên Başûrê Kurdistanê
Bûn remza biserketin û pêşveçûnan
Bi xwîn, xwêdan û fedakarî
Bilind kirin, rûmeta kurdewarî
Têkoşer çêjek ji vê biserketinê girt
Berê xwe da Kerkûkê
Wekî sergêrê herêmê
Gund bi gund şer da kirin
Şayenî madalyaya biserketinê
Xetek xêz kir ji gerîlayan
Kerkûk ta Mexmûr û ji Mexmûr ta Şingalê
Ax û ar parastîbû êdî
Bi fermana Rêber Ocalan
Û bi destê gerîlayên PKKê

**-23-**

Xakûrkê: erdnîgarîyeka hingivîn
Xwedî gelîyên jîyanê
Axa Biradostan a bibereket e
Radestnebûyî û her xweser mayî

Warên kurdên azad, mîna kelehên xweparastinê ne. Tê da dijî teyr û tilûr, xwedî sedan cor pincaran e. Fêkîyê deresayî muhteşemîya xwezayê ne. Wisa jî kêm nabin seferên dagirkerîyê. Ev serpêhatîyeka dûr û dirêj e, dagirtîye bi dagirkerî û li hember ber xwe danê.
Sala 1982 destanekî nûjen dest pê kir, hîna dawî lê nehatîye; nivîskarên destanê li ser kar in. Dinivîsin her kêlî. Xiyanetkar jî hene û xwefiroş jî kêm nabin. Gelo, ev destan dê çawa bi dawî bibe?

Ji Libnanê bi rê ketin
Li kort û newalan bi cih bûn
Ebas, Cuma, Egîdê nemir
Tê da kar û xebat kirin
Hilperîn ber bi Bakur ve
Serdar û serkêş Egîd bû
Gavek avêt li Dihê
Gava Panzdehê Tebaxê

Li Xakûrkêya ji resenîya xwe da kurdî
Di şerê not û du da
Osmanê çilek wekî çeqel bû
Lê li ber xwe dida
Harûn û Hisên
Wekî teyrên efsaneyan bûn ew
Merdî û namerdî di pêşbirkê da bûn
Gotina dawî Bêrîtanê xêz kir
Lê danî xeta berxwedanê
Ku nema fîşek û bombe
Xwe berda xwarê
Serşor kir qaşo pêşmerge
Û xwefiroşên Berzanê
Tilîlî û qêrînê
Wisa encam da bi berxwedanê
Hinek çûn li ser sergoyê dîrokê
Lê ew bûn lehengên çîrokê

Sal du hezar û çardeh
Vê carê li meydanê
Têkoşer û Têkoşîn
Du fermandarên çeleng hebûn
Berdewama destanê ne
Rûpel dinivîsandin û diqulipandin
Li dijî artêşa romê û xiyanetê
Têkoşîn; hevala dozê
Bejinzirav û navser e
Por berdayî li ser milan e
Birû, bijangên tarî
Û li ser lêvan kenên bêdawî
Tenişt Têkoşerî
Dikir xebat û tevkarî
Ev e hevsengîya regezî
Hevaltî xweş li hev anî
Da ku bigihên biserketina hetahetayî

Têkoşer ku plan dikir çalakî
Serê sibehê heta êvarê
Bi tevger û liv û lebat bû
Êvarê ku gihan ava Hecî Begê
Dest pê kir çalakî
Wisa jî biserketî
Di bin venêrîna Têkoşer da
Mamosteyê jîyanê
Wisa jî perwerde dikir
Şervanê nûhatî
Digihand asta tolegirîyê
Dida şerkirin xweşhalî
Biencam bûn hemû çalakî

Karker, Şekîf, Evdilkovî
Gir û lûtke bûn tev
Gerîlayan
Hêlîn û starên xwe
Danîbûn bi qencî
Pevçûn û çalakîyên şev û rojan
Wekî agirgehan bûn
Bi ser xwe da dianîn bawermendan

Qada Şehîd Bêrîtan
Xweşwar bû bo gerîlayan
Girê Lêlkan wekî şewkaya pêşîyan
Di ser da dijîn çêrên jin û mêr
Dikirin xweş galgale
Di şevbihêrkên êvaran da
Li Şehîdgeha Şehîd Bêrîtan
Dispartin şehîdên dilan
Di serenomîyên wan da
Bêjer bû Têkoşerê wan şêrgeleyan

Bistan li zevîyan rast dikirin
Têkoşer û Têkoşîn bûn baxçevan
Timî dîyar bûn
Li hemû qadên jîyanê
Bi xwe ra dianîn biserketin û
Peroşîya şoreşgerî
Piştî pratîka li van deveran
Têkoşer da rê
Quliband gir û tap, gelî û newal
Kenek li ser lêvan û
Timî peroşhal

**-24-**

Îcar li Zapê bû Têkoşer
Li Şikefta Birîndaran
Û Girê Karker
Kurê Jaro heta Girê Hekarî
Xwedî destan û serpêhatîyan bû

Çema Zê mîna dîroka kurdan bû
Geh bi hêrs, bi kîn diherikî
Geh nazik û nazenîn
Li Gelîyê Zê
Her darmazî û her zinar
Govanê lehengî û ketinan bû

Zap: ji ber seferên dagirkerîyê
Dilgiran dibû her car
Ku sitêrk dicivîyan
Ha wisa jî ku lê didan
Diperitand enî û çeperên dijminan
Bi ser xwe ve dihat Zap
Dilşad dibû bi kûrahî

Li hember topbaran û balefiran
Himêza xwe ji gerîlayan ra vedikir
Kurê Jaro li hember Şikefta Birîndaran
Xwedî dikir keç û xortên çeleng
Û dor hatibû Têkoşer
Zap şad û bextewer bû
Ji ber pîdanîna pîyên Têkoşer
Şiverê bi baldarbûn
Ji bo neêşînin bin lingên Têkoşer

Têkoşer!
Di civînan da bû bênavber
Plan datanî her beyanî û êvar
Rêxistinker bû her xulek û kêlî
Wisa jî perwerdeker
Hem leşkerî û hem jî bîrdozî
Fermandar bû ew, bi ruhê gerîlatî
Pêşeng bû ew lê xwedî ruhê mîlîtantî
Di xwe da pêk dianî
Fikir û zikirê Rêbertî
Dimeşîya û şîn dikir
Şûnpîyên gerîlatî
Bihareka Partîyê bû
Dikir gulistan
Her cihê ku lê dima

Li kêleka Zapê
Li hêla rojava
Heye herêma bi navê Metîna
Hat veguhestin bo sergêrîya qadê
Ew bû êdî fermandarê wê herêmê

**-25-**

Metîna ceng e
Metîna berxwedan e
Xwedî kanîyên pak e
Li Kaşûrayê heta gelîyê Zê
Seranser xwîna şehîdan e
Û Metîna raserî Amedîyê
Xoşewîsta Garê û Çolemêrgê ye
Dinale û li ber xwe dide
Bi gorbihuştan şerefmende ye
Şanaz e bi gerîlayan
Lê di dil da xencera xiyanetê
Dinale Metîna û serbilind e jî

Dema Têkoşer dest bi fermandartî kir
Liv û lebat hebû li her alî
Li Bakur dagirker
Li Başûr hebûn noker
Ditirsîyan pêşveçûn û biserketinan
Ji Xorî û Medan heta derketina PKKyîyan
Dîrokeka kambax hatibû pê
Asîmîlasyon veguherîye oto asîmîlasyonê
Wisa bîr û bawerî, ziman; diman bin lingan
Hest û awazê dagirkeran
Di kerika guh da dida olan
Lê kurdan her dikir serhildan

Îro li Metîna
Gerîlayan govend digerand
Bo kurdên jar û belengaz

Têkoşer li gel parêzvanan
Digerîya tîm bi tîm, taxim bi taxim
Hevalî dicivand dikir galgal
Zîhnîyet felsefe û datanî taktîkên şer
Da ku hevalî tev bibin têkoşer
Li hember dijmin bikin axir şer
Dîyarî bikin welat bo dayîkên xweragir
Bo dayîkên tijî elem û keser

Bîstê tebaxê du hezar û nozdeh
Têkoşer ku da rê bi maşîneyê
Ax û aman û hewar
Di tevgerê da bûn kuçikên har
Wekî serhildan û berxwedanên pêşîyan
Xayin ketin kar
Bi xencera bêkerametîyê û axuyê mar
Li ser zikê dijmin da bûbûn har
Û tevdigerîyan ax û eman û hewar

Sal du hezar û nozdeh
Bîstê tebaxa egîdan
Li herêma Metîna
Li jêra wê Amedîya bavkalan
Dagir kirîye neyaran
Kaşûra di milê din da
Çolemêrga li Bakurê
Li banî Girê Beranan
Rojhilat; Çemê Zê
Li navê Girê Hekarîyê
Hêlîna berxwedêran

Metîna: radestnebûyî ye
Dijmin: xwedî biryara ferman e
Xiyanetkar: di dest da xençera xîyanetê
Ax li minê hewar
Li ser kar in egîdkuj
Hey çepel û xayîn!
Nekuje şêran
Nebe parîyê devê kuçikê dijminan

Lê mixabinî kar e îro
Li ezman, li erdê
Nemerdî dimeşe
Teknolojî alîkar e
Di şerê man û nemanê da

Kordîne dîyar e
Egîdên me şîyar in lê
Di tevgerê da ye Ehrîman

Peyabûna ji maşîneyê
Belavbûna li bejahîyê
Bêkêr e îro

Fermandar li gel du heval û hogiran
Ketine xefikê bi dor
Bermîl, fuze, roket
Dibarin ji devê hûtan

Qeşengê Metînayê
Wisa bi bejn û bal
Xwînsar, aram, rûken
Bi ser hev da teqîn
Ev teqînên nedîtî
Beden li erdê dirêjkirî
Asîman tev şîn
Şîneka ebed da

Niştecih, heval tev parêzvanan
Ku gihan serî
Ev canik û camêrî
Radimûsin enîyên cangoran
Hêz dibin ji nû ve
Rewanî, heyberî li her alî

Ken xwe li xiyanetkaran girtibû
Li paytexta xiyanetkaran Hewlêrê
Tev kurdewar bûn qaşo
Cil kurdî, ziman kurdî
Lê bêesil û fesil
Ji kevin da xayîn
Gladyoya nav kurdan
Tev ît û MÎT û kontra bûn

Li Ankarayê kêfxweşîyeka mecazî
Ev in tolaz, sutalê alemê
Hesûdin ji ber xweşmirovên me
Wisa dizanîn ku tune dibin em
Lê
Naqedin em
Wekî darmazîya vê erdnîgarîyê
Bi rik, kîn û nefret in
Bi her birînê ra gurtir dibin

Heval û hogir civîyan
Sond xwarin
Sonda tolhildanê
Merasîm danîn ber êvarê
Raweste amade be
Raweste amade be
Silavaaa cangoran

Darbest li ser milan
Di ser da bedenê dildarê welat
Hilkişîyan li banî
Govend gerandin
Ji pêşîyan mayî
Tilîlî û her tilîlî
Qîrîyan
Qîrînên heft erş û asîman derbaskirî
Û gotin:
Evîna vî welatî
Dike gor
Da ku evîndar
Argeş û rûgeş bin

Li banî Têkoşer bişirî
Û her ma li banî